# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (291):

## Dijatiyek li ser sivîlekî, girtinine bêsûcane, ziyabûna coyên avdanê yên Benda Meydankê, şewtandinin mebestkirî yen fere digihêjin daristanan, pevçûnin xwînî di nav sivîlan de

Bi şahî û rêweresman, li 14.05.2024an. Z, avahiya nû ya "Encûmena Xwecihî li Efrînê" ji aliyê "**Mistefa Masetlî**/Waliyê Hetayê ya Turkiyê" ve - weke berpirsiyarê yekê ji herêmê re hate vekirin, û herweha jî serokatiya civata yekê ya encûmenê li piştî vekirinê yekser kir, bê beşdarbûna "**Ebid El'rehman Mistefa**" - serokê "Hikometa Sûrî ya Demkî", yê ku li xwe xera bûye, vêca neçar bû ku li 02.06.2024an. Z seredana encûmenê di avahiya nû de bike, û jê re şirîtek li ber dergeha serekîn hate amedekirin da ku qut bike û wêneyan bigire, û rûpela "Hikometê" li ser Fêsbokê nûçeyek bi "vekirina avahiya nû" ji aliyê wî ve belav kir, lê rûpela encûmenê wêneya qutkirina şirîtê xuya nekir, û beşdarbûna "Mistefa" di wê rojê de bi "serdana serokê hikometê" bi nav kir.

Ev yeka careke din tekez dike ku Destlatên Turkiyê li Efrînê fermandar in, û bi rastî Turkiyê dewleteke dagîrker e, û "Hemahengiya Sûrî - Ixwanî" û hikometa wê ya demkî û milîseyên Sûrî yên bi ser Anqerê ve, bi dest Hikometa Dad û Geşepêdanê/El'dedalê we El'tenmiyê û serokê wê "Receb Teyêb Erdoxan" de alav in.




**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Bendkirin û îşkencekirina sivîlekî Kurd:**

Berî du heftan, giropeke Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" mala Hemwelatî "**Elî Salêh Salêh** /45/sal" ji xelkê Gundê "Eltaniya" li orta Bajaroka "Reco" basmîş kir, li pêş malbatê bi lêdan û sixêfan kêmrûmet kir, û bire biryargeha xwe, û li dirêjahiya çend katan hate îşkencekirin, ta ku ew berdan; Û ew jî ji ber nerazîbûna wî ku mala xwe radestî "**El'muqedem Ebo Muder** - serokê biryargehê" bike, mala ku ji aliyê anîndeyekî din ve - yê ku ji sala 2018an. Z ve bê kirê tê de rûniştî- hatiye valakirin, bi behaneya ku mal a birayê wî yê ne li wir e, di heman dema ku hemî cîran û nasên wî yên li bajarokê dibêjin mal a "Elî" ye.







**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:**

- Di navboriya du heftên dawiyê de û li dû hev, ev hemwelatî "**Arêf Menan Reşîd** /70/sal, **Umer Gulîn Reşîd** /60/sal, **Şe'iban Hisên Hemo** /60/sal, **Fa'êq îsma'îl Îsma'îl** /56/sal, **Îsma'îl Silêman Bîlal** /42/sal, **Selah Elî Sîn**/Malbata Heşko /49/sal, **Şêx Mihemed Mihemed** /70/sal, **Ezet Bîlal Îsma'îl** /56/sal, **Xelîl Reşîd Şêxo** /50/sal, **Mihemed Mistefa Emîn**/Malbata Ne'isik /50/sal, **Mihemed Şêxo Qenber** /66/sal" ji xelkê Gundên "Meydana" - Reco, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û milîseyên asayêşê ve, bi tewanbariyên têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser (RX) a berê re (Komîn, payandina şevayî...), û piştî bendkirina du - sê rojan û ferzkirina baceyeke diravî /200/Dolar Emrîkî li ser her yekî ji wan ew berdan, û di dû re jî bi dandina /100/ Dolarî din li rûniştina dû re ya dadgehê bê tewawkirin, û tewanbariyên pê hatine tewanbarkirin tevî daxuyanên wan ên kesayetî -ta ku bêsûc bin jî- hatin belgekirin.

**= Ziyabûna/miçiqbûna coyên avdanê yên "Benda Meydankê":**

Naskirî ye ku **Benda Meydankê (Benda 17 Avrêlê/Nîsanê)** li herêmê pirojeyeke istiratîcî ye, kanîna/taqeta wê girtina avê ya herî bilind dora **/220/ milyon mitir kabik** av e, û sûda jê tê dîtin ev e: Peydakirina ava vexwarinê niha bi tibabeke dora /25/ milyon mitir kabik salane ji herdu Bajarên Efrînê û Ezazê re (ji salên berî kirîzê zêdetir bû, bi sedema dubarebûna hejmarên yên li herdu bajaran rûniştî), û herweha jî avdana dora /30/hezar hiktar ji zevî û erdên çandiniyê (zeytûn, darên biber, genim, ceh, keskahî...HWD), lê di navboriya van salên dawîn de rêjeya sûdegirtinê ji bendê di avdanê de daket, ji ber ku Çemê Efrînê li Havîna borî miçiqî, û îsal jî ta niha ava avdanê di toreyên avdanê re nehatiye berdan, ji bilî ya ku pir kêm di çêm re diherike, di wexta ku werzên liban bi dawî bûn û piraniya baxçên keskahiyê û fêkiyan jî di rojên xwe yên herî teng de ne, û sedema vê yekê jî daketina tibaba ava li Zivistanê di bendê de bendkirî, û bi ser de jî rawestandina û derketina istasyûnên avdanê (Gemrûkê, Astêr/Tiltewîlê, Cûmkê, Bablîtê) ji xizmetguzariyê, bi sedema dizîna acet û pêdiviyên wan ji aliyê milîseyan ve.




Jêdereke xwecihî ragihand, ku hevrêzkarê Turkî yê serpereştkar li ser bendê weke tê xwestin ava barana zivistanê nedigirt, weke çawa ji berî dagîrikirina Turkiyê li sala 2018an. Z dihate kirin, dema ku bi tevahî

dihate girtin û li dawiyê bermahî berdidan çêm; Lê îsal rêje û asta herikandina avê di çêm de bilind bû, da ku biherike **Benda "Rîhaniyê"** ya Turkî -cîgeha ku Çemê Efrînê lê kom dibe- û tijî bibe (hilgirtina wê yê gencînekirinê **/900/ milyon mitir kabok** e), û ew li sala 2020an. Z hate vekirin, bi ser hebûna çar bendên din jî li ser şaxên ku têne ser Çemê Efrînê li aliyê Turkiyê, û mezintirîn bend jê jî Benda Efrínê ya Bilind e (/38/milyon mitir kabok) a ku li sala 2021an. Z hatiye vekirin.

Wêlomê, û ji ber ziwabûna piraniya bîrên ava rûyîtî, piraniya cotkaran dest bi kolandina bîrên kûr ên deryayî -bêtirî /350/m- dikin, û xerciyên zêde di avdanê de hildigirin.

Û bi bermberkirinê di navbera du wêneyên Benda Meydankê re, ya yekê li 10.01.2019an. Z li dema ku ava zêde ji bendê diherikî çêm, û ya dudiyê li 04.06.2024an. Z dema ku rêjeya avê di bendê de nizim, emê cudahiya fere di navêna gencîneya herdu salan de bibînin, bi ser ku baran di herdu salên hatine zimên de nêzîkî hev bûn û bêtirî /500/milî mitir bûn.







**= Şewatên daristanan:**

Bi destpêka Havîna her salekê re, ji navboriya salên dagîrkirina Turkiyê ji sala 2018an. Z ve, şewtandinên daristanan li Efrînê zêde dibin, bi rêjeyine pir bilindtir ji yên li dema hebûna saziyên dewletê li dirêjiya dehsalan û herweha jî di dema Rêvebiriya Xweser a berê de (2012 - 2018. Z), di encama siyaseta qirkirina rêbazkirî ya ku hatiye meşandin û ta niha jî li dijî daristanên xwezayî, yên ku rûbera wan li berî dagîrkeriyê (18500) hiktar û yên çandiniyê jî (21000) hiktar li Efrînê, û rêjeya qirkirinê tê de ta niha gihîştiye bêtirî 60%, yanê dora (/6/milyon darên îhracê yên xwezayî + /13/milyon darên îhracê yên çandiniyê = **/19/milyon dar**) û bi ser de jî bi milyonan darên biçûk ên di nav darên mezin de ji holê hatin rakirin, bi riya qutkirina fere û ta hilkirina kokan bi alavên giran, û bi agirpêxistinê tê de; Û wek nimûne:

**-** Li Êvara Duşemê 03.06.2024an. Z, agirin bi daristaneke Gundê "**Çema**" - Navça "Şera" hatin xistin, û di encamê de /40/darî sinoberê û /20/darên zeytûnê bi rûbereke dora /40/ donimî hate şewtandin - li gor "Berevaniya Sivîl a Sûrî", ya ku tekez kiriye ku tîpên wê bêtirî sê katan kar kiriye ta ku vemirandiye.



**-** Li roja Sêşemê 04.06.2024an. Z, agirin bi geliyê di navêna herdu Gundên "**Naza**" û "**Derwîş**" - N. Şera de hatin xistin, û di encamê de darine îhracê ye xwezayî û bi deha darên zeytûnê yên jê ve nêzîk -ên xelkê Gundê "Bêlê" yê hevcîwar ji wan re- hatin şewtandin.

**-** Li roja Çarşemê 05.06.2024an. Z, agirin bi çiyayê hember Gundê "**Çêqilme**" - Navça Reco hatin xistin, û di encamê de rûbereke mezin ji darine îhracê yen xwezayî hatin şewtandin, û jêdereke xwecihî tekez kir, ku armanc jê bermahiyên qutkirinê û şivên zirav nemînin, û paşê jî kokên darên hatine qutkirin werin diyarkirin, da ku bi hêsanî bêne derxistin.

**-** Li Êvara Înê 07.06.2024an. Z, agirin bi hirşê Gundê "**Remedana**" - Navça Cindirêsê hatin xistin, û di encamê de dora /150/ donim ji rûbereke kesk hate şewitandin, li gor "Berevaniya Sivîl a Sûrî", ya ku tekez kiriye ku tîpên wê /14/katan kar kirin ta ku ew vemirandin.




**-** Ji destpêka Êvara Duşemê ve 03.06.2024an. Z, agir bi daristana îhracê li **Çiyayê Hawarê** (yê ku di navbera herdu navçên Reco û Bilbilê de) ketin, û bi Siba Sêşemê re fere bû û dîrakên dûmên bi rengekî pir bi jor ve hilkişiyan û li asîmana herêmê belav bûn, û weha ta Berbanga Pêncşemê -06.06.2024. Z- berdewam kir, û "Berevaniya Sivîl a Sûrî" ragîhand, ku wê piştî /44/katan ji karê dijwar û berdewam vemirandina wan bi dawî kir, û agiran dora /150/ hiktarî ji rûbera kesk şewitand, û herweha jî dora /1200/ darî zeytûnê û tirî yên xelkê Gundên "Dîkê" û "Çê" yên bi ser daristanê ve - li gor jêdereke xwecihî.







Çiyayê Hawarê xwedî cihekî ciyografî û xwezayî ye stratîcî ye, û daristaneke xwezayî ye zûgihayî ji darên Sindiyana normal, Zeytûna bejayî, Qetlebê, Nermikê, û darokên îhracê yên pel pan/pe'in, û gencîneyeke

tofan yên ji hev çêdibin guncaw dike, divabû bibe parastiyeke xwezayî, û cîgeheke xweş ji nawirên bejayî re jî.

Gundê "**Çê**" li hafa çiyakî ye, bilindahiya wî ji rûyê deryayê ve /960/ m ye, û tevaya nişteciyên gund ji aliyê Artêşa Turkiyê ve hatin koçberkirin, û herweha jî li wir ji xwe re bargeheke leşkerî damezrand, li dema desteserkirina li ser herêmê li Avdara 2018an. Z, û bi armancine siyasî û ewlehî - leşkerî, milîseyên bi ser xwe ve bi aliyê qutkirina daristanan û şewtandina wan de bi awakî fere têve dide.

Û tiştên mebestkirina şewtandina daristanên li Efrînê tekez dikin ev in:

**-** pirbûna xalên agiran û dûrbûna da navêna wan xalan de yên di yek daristanê de, weke çawa li Çiyayê Hawarê çêbûye.

**-** Hewildana serpeçinandina li ser piroseyên qutkirinê yên berê, yan jî ji bo vekirina riyan û jinavbirina bermayên êzingkirinê, da ku ser kokên binerd were açiqkirin û paşê jî werin hilkirin.

**-** Nepişikdariya milîseyan û destlatên xwecihî di piroseyên vemirandina agiran de.

**-** Nepişikdariya Turkiyê di pêşkêşkirina alîkariyan de -ne bi rengekî ji rengan- ji bo vemirandina agiran, bi ser ku ew xwediyê kanînên mezin ji kadro û alavên bejayî û asîmanî û herweha jî pêdiviyên taybet ên vemirandina agiran, û weke zanyarî jî cîgehên şewtandinê bêtirî /30/KM ji sînor ne dûr in; Û were bîranîn jî ji berî sala 2011an. Z, Sûriyê di piroseyên vemirandina agiran de pişikdarî dikir.

**-** Berdana vemirandina agiran bi ser "Berevaniya Sivîl a Sûrî" de, yê xwediyê kanînên nizim, û bê ku pêkanînên wê werin mekinkirin jî.

**= Pevçûnin xwînî di nav sivîlan de, li Bajarê Efrînê:**

Bi sedema nelihevkirinê li ser perçak erd ê yekî ji xelkê Bajarê Efrînê û desteserkirî ji sala 2018an. Z ji dema dagîrkirina herêmê ve, û li nêzîk kolana çûnûhatinê ya mazotê û avahiya nû ya encûmena xwecihî li Rojavayê bajêr, û hin dîkanên bazirganiyê yên pêşesazkirî/berake jî tê de, li Êvara Duşemê 03.06.2024an. Z, bi çekên sivik û giran di navêna du giropên çekdar de -piraniya endamên wan jî ji Gundewarê Dêrezorê- pevçûnin derketin (giropa yekê "**Mistefa El'kehim**" serkêşiya wê dike û girêdayî Milîseyên "**Ehrar El'şerqiyê**" ye, û ya din jî "**Ebo Malêk El'dêrî**" serkêşiyê dike û ji demekê ve ji "El'şerqiyê" qetiye û tevî Milîseyên "**Tîpa/Firqit El'hemzat**" bûye), di pevçûnan de pevçûnker derketin ser banên avahiyan û di nav kolanên bajêr de jî bi hev ketin, û di encamê de dîkanek/berakîk bazirganiyê digel beşek ji malekê hatin şewtandin, qurşîn û avêjtok li dehan mal û makînan ketin, ziyanin şênberî yen mezin çêbûn û hin nexweşxane hatin dorpêçkirin, bi ser kuştina çar endaman ji herdu aliyan û birîndarkirina bêtirî /20/ kesan -di nav de jî sivîl- û pabendbûna sivîlan di malên xwe de li bajêr.




Pevçûn derbasî Navça Cindirêsê bûn, û hêzin ji Milîseyên "Tîpa/Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" - hevalbendê "El'hemzat" bi navê "hêza hevbeş" êrişî biryargehin "Tevgera Rizgarkirin û Avekeriyê" kirin, ya

ku herdu hevalbendên serekîn Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê, Artêşa/ceyş El'şerqiyê" di nav xwe de dihewîne, û dest danîn ser hinan li Bajarê Cindirêsê û Derbasgeha Hemamê ya sînorî bi Turkiyê re. Û giropin din ji "El'emşat" gotin ku wan di heman Êvarê de rêbendeke li çateriya Gundê "Emara" û Gundên "Heyatê, Sêwiya, Kêlîbo" li Navça Mabeta desteser kirin û "El'şerqiyê" jê qewitandin, û li Navça Reco "El'hemzat" hin cîgehên "El'şerqiyê" topebaran kirin. Û "El'şerqiyê" biryargehên xwe yên li bajêr vala kirin, û li wir biryargehek an bêtir ên "**Tevgera Rizgarkirin û Avekeriyê**" man, ew tevgera ku bi hezaran mal û dîkan û embargeh li Bajarê Efrînê talan kiribûn û dest jî danîbû ser wan, û li kêlekê jî bi dehan perçerdên avakirinê û erdên çandiniyê ji 2018an. Z ve.

**Piştî demeke ne dirêj ji wan pevçûnên xwînî yên li Efrînê rûdane, û ew agirên bi zengîntirîn daristanên xwezayî ketine, dê dîsa serok "Erdoxan" û taxima/tîpa hikumdariya wî û dûvçilkên wî ji Sûriyan derkevin, da ku bê fedî li ser herêmeke aram li Bakurê Sûriyê baxivin, û bibêjin Efrîn di aştî û aramî û hêminiyê de dijî!**

08.06.2024. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Vekirina avahiya nû ya "Encûmena Xwecihî li Efrînê" du caran, cara yekê ji aliyê "Mistefa Masetlî/Waliyê Hetayê ya Turkî" ve, û ya dudiyê jî ji aliyê "Ebid El'rehman Mistefa/Serokê Hikometa Sûrî ya Demkî" ve.

- Sivîlê ku dijayetî li ser hatiye kirin "Elî Salêh Salêh".

- Biryargeha Reco ya Milîseyên Asayêşa Leşkerî, ya ku "El'muqedem Ebo Muder" serkêşiya wê dike.

- Benda Meydankê di navêna sala 2019 û 2024an. Z de.

- Çaksazkirina coyên avdanê li Efrînê li 08.06.2024an. Z, piştî dawîbûna werzên/mûsimên libeyan (genim, nok, nîsk....) û di orta werzên fêkî û keskahiyan de, bê ku jê bêne avdan.

- Şewatek li daristaneke nêzîk Gundê "Çema" - N. Şera, li 04.06.2024an. Z.

- Şewtek li Hirşê G. "Remedana" - N. Cindirêsê, li 07.06.2024an. Z.

- Şewatên daristana "Çiyayê Hawarê", 06.06.2024. Z.

- Çekdarên giropên pevçûnkirî ji Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" û "Tîpa/Firqit El'hemzat" hildikşin ser banên avahiyên niştecîbûnê li Bajarê Efrînê, 03.06.2024. Z.